FRONTEX / EURP BERNAMEYA JINÛVA-ENTEGREKIRINÊ YA YEKÎTIYA EWROPAYÊ

# ALÎKARIYA SER TEVLÎBÛNA DUBARE JI BO KOÇBERAN

di bin Xizmetên Tevlîbûna dubare yên Hevbeş ên Frontex de



GUHERTOYA KURDIYA KURMANCÎ

Em li vir in ji bo piştgiriya we

## QAZANCÊN VEGERA DILXWAZÎ ÇI NE?

**Em dizanin ku vegera we bo welatê we ya sereke re dibe ku dijwar be. Em li vir in ji bo piştgiriya we. Em dikarin alîkarîya we bikin ku hûn xwe ji bo çûnê amade bikin û derfeta ku we piştî gihîştin xwe hene, ji we re bidin zanîn.**

Eger we biryar daye ser vegera dilxwazî yan jî we biryara vegerê ji rayedarên neteweyî yên Welatên Endam wergirtibin, dibe ku hûn xwedî merc bin ji bo standina alîkariyê ji Tevlîbûna dubare di civata welatê xwe de. Frontex ku Saziya Parastina Sînor û Perava Ewropî ye, bernameyek bi navê **Xizmetên Tevlîbûna dubare yên Hevbeş** çêkir, ku bi rêxistinên civakî yên sivîl ên li welatê we re tevdigere. Ev sazî di warê alîkarîya ji Tevlîbûna dubare da bi tecrûbe ne û dema hûn di destpêka nû da vedigerin malê amade ne ku piştgirîya we bikin.

> DİBE KU VEGER TEVLİHEV XUYA BİKE. DİKARE GELEK PİRSAN ÇÊ BİKE Û BİBE SEDEMA FİKARAN. **Jİ BO KU HÛN BERSİVAN BİBÎNİN, DÊ XEBATKARÊN PİSPOR ÊN WEKÎ ŞÊWİRMENDÊN VEGERÊ Û TEVLÎBÛNA DUBARE BERDESTÊ WE HEBİN.** EW WE Dİ WARÊ HİQÛQÎ, ÎDARÎ Û PSÎKOSOSYAL ÊN VEGERÊ Û TEVLÎBÛNA DUBARE DE RÊBERÎ DİKİN Û ALÎKARİYA WE DİKİN WE KU HÛN Jİ BO PÊŞEROJA XWE BAŞ BİBİJÊRİN.

Eger pêwîstiya we bi lênêrîna taybetî hebe, wek mînak, eger hûn jineke ducanî ya zarokek bêxwedî bin, eger hûn bûne qurbanê qaçaxçitiya mirovan an jî pirsgirêkên we yên bijîşkî yan astengdariyên we hebin, an jî bi zarokan re derkevin, ji kerema xwe şêwirmendê Veger û Tevlîbûna dubare yê xwe re ragihînin. Şêwirmend dê piştrast bike ku hemû şert û mercên şexsî yên têkildar hatine berçav girtin da ku bi cureya taybetî ya Tevlîbûna dubare ya we re guncawtir be.

## GELO JÎ BO STANDİNA ALÎKARİYA TEVLÎBÛNA DUBARE XWEDÎ MERC İM?

Hûn dikarin alîkarîya Tevlîbûna dubare bidest bixin, eger:

a. **Hêşta biryareke neyînî ya dawî** ser daxwaza we ji rûniştina qanûnî an/û parastina navneteweyî (penaberiyê) deji we re nehatiye dayîn û we biryara vegerê daye. Di vê rewşê da, emê li ser **vegera dilxwazî** biaxivin.

b. **We biryareke neyînî ya dawî,** û/an jî bi navê "biryara vegerê" wergirtiye, ku tê da derfetek diyar dike ku divê hûn ji axa Welatên Endam derkevin. We biryar da ku hûn vegerin welatê xwe yê sereke. Di vê rewşê da, emê li ser vegera dilxwazî biaxivin. Rayedarên neteweyî yên welatên Ewropî ku hûn lê dimînin, dê we agahdar bikin li ser gengaziya wergirtina alîkariyê ji bo tevlîbûn dubare û dema dawî ku divê hûn ji welêt derkevin de.

> EGER WE MAFÊ MAYÎN, RÛNIŞTINA QANÛNÎ Û/AN PARASTINA NAVNETEWEYÎ LI AXA WELATEKÎ ENDAM YÊ YE YÊ HEBE, **HÛN XWEDÎ MERC NÎNIN KU ALÎKARÎYA TEVLÎBÛNA DUBARE BISTÎNIN.**

c. **We biryara vegerê, wergirtiye**, wekî ku di beşa b de hat ravekirin, û we biryar neda ku hûn di dema diyarkirî bo (vegera dilxwazî) derkevin. Di vê rewşê de biryara vegerê tê sepandin e û hûnê encamên vegera bi darê zorê qebûl kin.

**Kerema xwe agadar bin** ku Welatên Endamên YE yê li gorî zagonên xwe yê neteweyî, dema ku hûn daxwaza xwe ji bo Xizmetên Tevlîbûna dubare yên Hevbeş pêşkêş dikin, berpirsyar in ku diyar bikin ka hûn ji bo wergirtina alîkariya tevlîbûna dubare xwedî merc in an na.

# JI BO TEVLÎBÛNA DUBARE ALÎKARÎYEKE ÇAWA BERDEST E?

Xizmetên Tevlîbûna dubare yên Hevbeş du cure alîkariyan dihewîne:

**Alîkariyên Demkurt:** Dema hûn têketin, gengaze ku di nav çend rojên pêşîn da bi şêweya radestkirina balafirgehê, mayîna demkurt, alîkarîyên bijîşkî, veguhastina pêşerojê, yekkirina malbatê û alîkarîya aborî ya sînordar ji we ra bihê pêşkêşkirin.

**Alîkariyên demdirêj:** Bernameyeke tevlîbûna dubare ji bo demeke herî zêde ya 12 mehan dikare pêk were. Şêwirmendê vegerê û tevlîbûna dubare ya we li welatê we yê mêvandar û rêxistina me ya li welatê we, vebijarkên herî baş ji we re nîqaş dikin û li ser vegera ji welatê we yê sereke re, li ser pêkanînê tê li hev bikin. mînakên ji bo alîkariya demdirêj ji tevlîbûna dubare, pêk tên ji:

- AVAHIYÊ DEMDIRÊJ Û XERCÊN TÊKILDAR
- ALÎKARIYÊN BIJÎŞKÎ YA BI RÊKÛPÊK
- PERWEDE (DIBISTAN Û PERWERDEYA PÎŞEYÎ)
- ŞÎRETÊN PÎŞEYÎ Û ALÎKARÎYÊ JI BO BERDESTKIRINA BAZARA KARÎ
- ALÎKARIYA JI BO RÊXISTINA KARSAZIYEK BIÇÛK
- YEKKIRINA MALBATÊ
- ŞÊWIRMENDIYA HUQÛQÎ Û PIŞTGIRIYA ÎDARÎ
- PIŞTGIRIYA DERÛNIYA CIVAKÎ

Di herdu rewşan de, hûn ê li ser navê Hevparê Tevlîbûna dubare piştgirîya pisporî bistînin, ku çavdêriya plana tevlîbûna dubare dike û herweha bi şandina we ji rêxistinên din ra, dikare alîkarîya we bike.

# JI ŞÊWIRMENDIYA XWE YA VEGERÊ Û TEVLÎBÛNA DUBARE EZ DIKARIM ÇI HÊVÎ DIKIM?

Di civîna şêwirmendiya takekesî ya bi şêwirmendê vegerê ra, hûn ê di derbarê derfetên vegerê û vebijêrkên ji bo piştgirî û alîkarîya ser tevlîbûna dubare da agahiyên baş bistînin. Şêwirmendê we ji bo piştgiriya we perwerde bûye û dikare bersiva hemû pirsên we yê gengazî bide. Hûn dikarin ji şêwirmendê xwe yê vegerandin û tevlîbûna dubare bipirsin ku di derbarê daxwaza we da kîjan maf hene. Di dema civîna şêwirmendiyê de, eger hûn di axaftina bi heman zimanê şêwekar re xwe rehet hîs nekin, hûn dikarin wergêrekî bixwazin.

Eger hûn eleqeya xwe ji bo wergirtina alîkariyan ji tevlîbûna dubare re tînin ziman, divê şêwirmendê we ji bo pêvajoya daxwaza we agahiyên girîng berhev bike. Ji we tê xwestin ku hûn li ser belgeyên nasnameyê, endamên malbatê û agahiyên têkilîyê yên pêkan û meqsedê de agahiyan bidin. Agahiyên hatine dayîn li gorî şertên zagonî yên parastina daneyan tên kom kirin. Ji kerema xwe, ji bo agahdarkirina şêwirmendê xwe li ser hewcedarîyên xwe yên taybet dudil nebin.

Di dema daxwazê da ji we tê xwestin ku formekê dagirin û destûrê bidin Frontexê ku daneyên we yên şexsî bi kar bîne. Ev agahî, ji bo piştrastkirina nasnameya we ji alîyê Hevparê Tevlîbûna dubare ve pêwîst e û li gorî Rêziknameya Parastina Daneyanên Giştî yê Ewropayê da dê tenê ji bo vê armancê were bikarînan.

**BALDARÎ**

# EZ DIKARIM JI HEVPAREYEKA ÇI HÊVÎ JI HEVPARÊ TEVLÎBÛNA DUBARE (HERÊMÎ) BIKIM?

Li welatê we yê sereke de, Hevparê Tevlîbûna dubare dê doza we bi rê ve bibe. Eger hûn alîkarîya demkurt bixwazin, dibe ku hevparê we li balafirgehê pêşwaziya we bike û di pêdivîyên herî lezgîn da piştgirîya we bike. Eger hûn dixwazin ji bo demeka dirêjtir alîkarîyê bistînin, Hevparê me yê Tevlîbûna dubare dê bi we ra têkildar be û hûn dê bikaribin bersivan ji pirsên xwe ra bistînin. Her tim têkiliya we bi hevparê me ra tê pêşwazî kirin. Eger pirsek an jî gumanên we hebin, ji kerema xwe bi hevparê tevlîbûna dubare ra bikevin têkilîyê.

**GOTINA VÊ YEKÊ PÊWÎST E KU:**

- Hevparê tevlîbûna dubare an ji hevkarên herêmî dê di saetên îdarî da alîkarîya we bikin.
- Tevgerên xerab û/an ji têkder li hemberî Hevparê Tevlîbûna dubare an jî hevparekî herêmî nayê qebûl kirin.
- Hevparê Tevlîbûna dubare nikare hemû pirsgirêkên ku hûn pê re rû bi rû bimînin çareser bike; ew di pêşkêşkirina alîkariyên ku berê hatine li hev kirirn de sînordar in.
- Ji bo destpêkirina daxwazê pêdiviya we bi belgeyek nasnameyê heye.
- Ji bo bidawîkirina pêvajoya daxwazê divê hûn formeke razîbûnê îmze bikin.

**JI KEREMA XWE LI WELATÊ XWE BI HEVPARÊ TEVLÎBÛNA DUBARE RE BIEVIN TÊKILIYÊ**

Dikarinin hemû agahiyan di malpera jêrîn de bên dîtin →




FPI-23.0027_KU

PRINT / TT-05-23-164-0G-C / ISBN 978-92-9406-394-6 / doi 10.2819/892265
PDF / TT-05-23-164-0G-N / ISBN 978-92-9406-382-3 / doi 10.2819/89424